

Li NRW-ê ji bo kesên îqameta wan Duldung e bidestxistina kar

Kesên li NRWê dijîn û îqameta wan Duldung be (misameha li wan tê kirin), ji bo bikaribin kar bikin, divê pêşiyê ji Daîreya Biyaniyan (Ausländer Behörde) **destûra kar** wergirin. Ji bo dana destûrê sê merc hene:

- **Moleta îqameta we ya li Almanyayê**
- **Bi welatê hûn jê tîn**
- **Cihê hûn li NRWê lê îqamet dikin**

BALDARÎ QEDEXEYA KAR !

Li gorî § 60-î xala 6 ya qanûna îqametê di van mercan de kar ji bo van kesan qedexe ye:

1. Eger hûn ji welatekî weke "welatê ewle" hatiye binavkirin tîn û we serlêdana ji bo mafê penaberiyê piştî 31.08.2015an dabe û hatibe redkirin.

⇒ *Ji bo qedexeya kar a diyarker(taînker) roja qeyda we ya pêşî ye. Ango roj, meh û sala li ser BüMA-ya we ye. Ji bo kesên ku BüMAya wan beriya 31.08.2015an hatibe amadekirin, qedexeya kar nîne.*

⇒ *Ev yek, li gorî qanûnê ji bo kesên ji sedemeke dinê Duldunga wan heye(bêyî serlêdana mafê penaberiyê) derbas nabe.*

*Niha ji bo: Albanya, Bosna- Hersek, Gana, Kosovo, Makedonya, Montenegro, Senegal, û Sirbîstan (Li pêveklî binêre, § 29a ya qanûna penaberiyê)

2. Ji bo kesên ku bo wergirtina alîkariya li gorî qanûna penaberiyê werbigrin, hatine Almanyayê.

an jî

3. Ji sedemên ku hûn berpîrsê wan in, hûn neyên dersînorkirin.

⇒ *Kesên misameha li wan tê kirin(xwedî Duldung), di rewşa ku weke mînak; Derheqê nasnameya xwe de agahiyên şaş dabin, an ji bo bidestxistina belgeyên nasnameya wan piştrast dikin, hewl nedin, bo nedersînorkirina xwe berpîrs in.*

⇒ *Herweha karmendên ABH-yê jî şaşiyên dikin. Jiber vê yekê divê herdem bê kontrolkirin, bê bi rastî jî sedemên bo qedexeya kar hene, an na.*

Eger qedexeya kar tune be, bidestxistina kar weha tê birêk û pêkkirin.

Îqameta ji 1 mehê heta 3 mehan:

Di sê mehê pêşî de dema li bendêmanê ye. Kar qedexe ye.

Îqameta heta 6 mehan:

Dema li bendêbûnê dikare heta 6 mehan dom bike. Ev bi vê yekê ve girêdayî ye bê kesek li wargeheke eyaletê çewa hatiye bicîhkirin.

Piştî libendêbûnê heta îqameta 15 mehî:

Niha mercên bo bidestxistina kar hene. Daîreya Biyaniyan bo biryardana serlêdanê bo destûra kar, riza **Ajansa Federal ya Kar** (Bundesagentur für Arbeit) digre. **Ew**(Ajansa Kar) **herdem dinirxîne:**

- Ka gelo bê dê mercên kar ji bo kesê/kesa misameha lê tê kirin jî weke mercên karkerên alman.

Eger kesê misamehe lê tê kirin li devereke ku **Ajansên Kar ên Dortmund, Duisburg, Essen, Gelsenkirchen, Oberhausen an jî Recklinghausen** îqamet dike, ev yek jî tê nirxandin:

- Bê ev kar bo Almanan, karkerên ji welatekî Yekîtiya Ewropayê, an jî kesek bi îqameteke ku derceya wê bilindtir re ye. (Kontrola pêşaniyê)

ISTISNA: Ajansa Kar ji bo hin pîşeyan(meslek) kontrola pêşaniyê bikar nayîne. Wekî din jî rewşên awarte hene ku bi tevayî ev yek nayê bikar anîn. **

Îqameta ji 16 ta 48 mehan:

Li vir tê nirxandin bê gelo li **temamê NRW-ê** bicîhkirina kar bo kesê/kesa bi Duldung weke şert û mercê karkerek alman mimkin e, an na.

Îqameta ji 49 mehan pê ve:

Riza Ajansa Kar êdî ne pêwîst e. Eger bi taybet qedexeya kar tune be, kesê/kesa xwediyê/xwedîya Duldungê dikare di her karî de bixebite. **Lê divê ev yek ji aliyê Daîreya Biyaniyan li ser belgeyê bête nivîsandin.**

⇒ *Biryara teqez, bê gelo destûra kar tê dayin, an na ya Daîreya Biyaniya ye.*

⇒ *Destûra kar, piştî bidawîbûna dema libendêbûnê jî ji aliyê Daîreya Biyaniya xwe bi xwe li ser kaxeza nasnameyê nayê nivîsandin. Ji bo vê yekê divê mirov bi xwe bi awayekî çalak hewl bide.*

Kurmandschi

(Zugang zu Beschäftigung für
Personen mit Duldung in NRW)



Têkilî

Kar û şuxlên bi serê xwe

Eger Daîreya Biyaniyan bi awayekî eşkere destûr bide, kesên xwedî Duldung dikarin karê bi serê xwe bikin.

Hûn dikarin agahiyên di vê derbarê de ji vê linkê peyda bikin: <http://www.bamf.de/DE/Infothek/FragenAntworten/ZugangArbeitFluechtlinge/zugang-arbeit-fluechtlinge-node.html>

Karê demkî

Heta dema kontrola pêşaniyê bidawî nebe, karekî demkî ne mimkin e. Jiber li gelek deverên NRWê kontrola pêşaniyê ji 6.ê Tebaxa 2016an ve hatiye rawestandî, ferqiyetên herêmi hene.

Li **deverên Ajansa Kar ên Bochum, Dortmund, Essen Duisburg, Gelsenkirchen, Oberhausen û Recklinghausenê** kontrola pêşaniyê nehatiye rawestandî. Lewma li van deveran karê demkî piştî îqameteke bi dirêjajiyê 15 mehan dikare bê bidestxistin.** Lê li devera ku karê demkî berê mimkin bû ev yek istisna ye.

Wekî din li her devera NRWê, piştî dema libendêbûnê, destpêka kar mimkin e.

**** AGAHİYÊN DINÊ** yên derbarê bazara kar û şuxil de bo kesên bi Duldung hûn dê li vir peyda bikin:

www.frnw.de/alpha-owl/hintergrundinfos

Lisa Walter

alpha OWL II
Flüchtlingsrat NRW e.V.
Wittener Straße 201
D- 44803 Bochum

Tel.: +49 (0) 234 - 587315 - 80
Fax: +49 (0) 234 - 587315 - 75

Telefonsprechzeiten: Mo-Do, 10-16 Uhr
E-Mail: alphaOWL@frnrw.de
www.frnw.de/alpha-owl/

Das Projekt alpha OWL II wird im Rahmen der ESF Integrationsrichtlinie Bund im Handlungsschwerpunkt „Integration von Asylbewerber/ -innen und Flüchtlingen (IvAF)“ durch das Bundesministerium für Arbeit und Soziales und den Europäischen Sozialfonds gefördert.



FlüchtlingsRAT NRW e.V.

**Ji bo kesên îqameta
wan Duldung e, bi-
destxistina kar**

(Çiriya Paşîn 2016)

Herausgeber: Flüchtlingsrat NRW e.V. im
Rahmen des Projektes alpha OWL II